

## Dezgeha Perwerde û Lêkolînê ya PDKÎ civînek lidar xist

»»» R:3







## Mistefa Hicrî: Kurdistana Rojhilat, ji bo serhildanê amade ye

»»» R:2

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

www.agirimedia.org Hejmar (350) 22-05-2019 Buha (1000) Tûmen

## Civakeke zindî û xweragir

»»» R:2



# Mirina rejîmê nîşanî wê didin

Dunald Tramp serkomarê Amerîkayê, roja Duşemî rêkefta 31`ê Banemera 1398`an, bi awayê fermî ragihand ku, "hekî Îran li dijî berjewendiyên Amerîkayê pêngavan bavêje, dijkiryareke micid wê me hebe, Îran şaştiyekê mezin û dîrokî encam dide, hekî li dijî me herheketekê encam bide. Herwisa got jî, reftarên Îranê yên li dijî me, wekî dijmnatiyê ye, herçend ku tu nîşaneyek heya niha di vê derheqê de nehatiye xuyakirin, lê nayê haşakirin ku komara Îslamî serekîtirîn piştevanê terorîszmê ye.

Nûtirîn nîqaşên "Tramp", yên derheq komara Îslamî, piştî vê hatine gorê ku, di heyama rojên derbazbûyî de, şerekî devkî û xuya di navbera rayedarên herdu aliyan de hate gorê, berê jî serkomarê Amerîkayê gotibû ku: Hekî Îran ji şer hez bike, ev yek dawiya fermî ya Îranê dibe, û baştir ev e ku, tu demî gefan ji Amerîkayê nexwe.

Ji aliyekî din ve jî, malpera "Indipendent" roja Şemî 28`ê Banemara 1398`an, dabû Mirina rejîmê nîşanî didin eşkerekirin ku, çend dîplomatên girêdaiyî Îdareya Balafirxaneya Amerîkayê ragihandine ku, aloziyên vê dawiyê metirsîdar in bo ser Pîşeya Esmanî ya navneteweyî.

Piştî berfirehbûna aloziyên di navbera Tehran û "Washington"ê dîplomatên Amerîkayê hişdarî ji kompaniyayên balafiran re dane ku, li esmanê Kendavê mifahê wernegirin, û bas ji vê jî kirine ku, renge bi şaşî bên naskirin û rastî êrîşan bên.

Ev hişdariyane piştî daxuyaniya kompaniyayeke Bîme ya Birîtaniyayê, ya derheq metirsîdarbûna bikaranîna gemiyan li herêma Kendavê hatiye ragihandin.

Ev nîgeraniya derheq bi şer û aloziyên deverê, piştî şandina gemiya balafirhilgir û bombavêjan, ji aliyê Koşka Spî ve hatiye gorê, ku armanc rûbirûbûna lihemberî gefên Îranê, li kendavê hatine cihgîrkirin.

Her di vê rojê de, "Mike Pompeo" Wezîrê Karê Derve yê Amerîkayê, digel Wezîrê Karê Derve yê Çîn û "Welî`ehd"ê Erebistanê, derheq rewşa Îranê, ji rêya telefonê axavtin kir, û di vê derheqê komek pirsên derheq ewlehiya deverê anîne ber bas, û herwisa bas ji bihêzkirina alîkariyên di navbera wan aliyan de kirin, Erebistan, Amerîka û welatên herêmê, destdirêjiyên rejîma Îslamî a Îranê, sebeba aloziyan di herêm û cîhanê de dane zanîn, ku her bi sedema vê rikeberiyê jî, egera êrîşkirina leşkerî li dijî rejîma Îranê li gorê de ye.

Rewşa ku îşare pê hatiye kirin, û herwisa şerfiroşiyên rejîma Tehranê di heyama rojên derbazbûyî de, li dijî Amerîkayiyan yên herî xuya êrîşa mûşekî bo ser devera Kesk li Bexda û hereketên Kendavê bûn, û dewleta Birîtaniyayê jî bi awayê fermî aniye ser hêl û her di vê derheqê de, Wezîrê Karê Derve yê wî welatî ji Tehranê re hişdarî daye."Jeremi Hant" Wezîrê Karê Derve yê Birîtaniyayê, derheq êrîşa mûşekî ya li dijî devera Kesk a li Îraqê, gotiye ku: "Ez dibe ji rejîma Îranê re bêjim ku, hewla ceribandina Amerîkayê nede,



çimkû Amerîka naxwaze şer bike, lê, hekî êrîşî ser berjewendiyên wan bê kirin, ewê tola xwe bistînin (hilînin), eva tiştek e ku Îran dibe bizanibe, û her di vê derheqê de,dibe gellek bi hûrî û hişyarî serederiyê bike".

Di dawiya peyam û nîqaşên "Tramp" de, rû li karbidestên Komara Îslamî, serkomarê Amerîkayê gotiye ku: Tenê demekê pêwendiyê bi wî re bigirin ku, bi tewahî amade bin da ku digel de gotûbêjan encam bidin.

Di heyama du hefteyên derbazbûyî de, Koşka Spî gemiya balafirhilgir ya bi navê "Abraham Linkolen" û çend gemiyên şer yên din û herwisa bombhavêjên "B52" yên xwe jî, bo Kendavê veguhastine, û eva egera şerekî giran di navbera Amerîka û Îranê de zêdetir dike.

Hevdem saziya NY jî bi awayî fermî ji herdu aliyan daxwaz kiriye ku zêdetir hewl bo zêdebûna aloziyan nedin û nîgeraniya xwe derheq şerê devkî yên dinavbera wan de nîşan da.

Gefxwarin û givaşên Tehranê yên Amerîkayê di demekê de ne ku, li gorî gotina çavdêrên siyasî û karnasên karûbarên Îranê, komara Îslamî her niha di rewşeke dijwar de ye, û bitaybet ji aliyê aborî ve, ketiye rewşekê de ku, nikare heya hewcehiyên rojane yên xwe û xelkê jî dabîn bike, û herwisa berdewamkirina baykutan bitaybet lidjî kerta neftê di paşerojê de, wisa wê bike ku eva ku niha heye jî wê jê bêpar be. Her di vê derheqê de, Ferhad Silêmanpûr karnasê Aborî li Kurdistanê ragihandiye ku: Aboriya Îranê li qonaxa daketinê çûye qonaxa çeqîn (sekinîn)a aborî û berdewambûna vê pirsgirêkê encama siyasî û civakî a micid li pey heye, dibe jî, bibe sedema herifîna komara Îslamî, û dawî pê bê.

## Sergotar

# Civakeke zindî û xweragir

N: Kerîm Perwîzî

Welatek yan neteweyek ku dikeve bin destê deshilateke din de, di destpêka vê bindestiyê de hewleke yekcar zêde û xwîneke zaf dide heya ku vê bindestbûnê qebûl neke, û rê nede ku deshilateke sepandî bi sanahî li her derê belav bibe, û ne tenê deshilateke leşkerî belkû hêza siyasî û civakî jî bi ser vê neteweyê de bisepîne.

Neteweya Kurd jî çi li dewrana hikûmeta paşatiya Pehlewî de û çi jî piştî hatina ser kar a rejîma Xomêynî, xwîn û xebateke zêde daye heya ku rê bi sepandina giştgîr ya deshilata stemkar a navendî nede.

Ya ku di derbazbûyî de rû daye, nîşan dide ku dîrok hilgirê rûpelên tomarkirî ên xebata neteweya Kurd e. Hewl û tekoşîn û xebata neteweya Kurd ew bû ku hekî rejîma stemkar a Tehranê di warê hêza leşkerî de bihêztir e, û bi çek û teqemeniyên berfireh ên rejîma pêşîn û herweha ew teqemeniyên ku cihên din dane wan, wan kariye ku Spah û hêza dagîrker a xwe di Kurdistanê de bisepînin, lê rê nedin hejmoniya rejîmê.

Rejîma Îslamiya Îranê tenê timayiya (temaha) wê ya leşkerî tunebûye. Herçend ku temaha leşkerî û êrîşa leşkerî, destpêka dasepandina deshilatê ye, lê rejîma zal hewl daye ku encama êrîşa leşkerî bike helandina îradeya Kurdistanê.

Di heyama çil salên borî de piştî biryara cehada Xomêynî li dijî Kurdistanê û Kurdan, heya niha jî vê rejîmê bi siyaset û pîlanên cur bi cur hewl daye ku çi ji riya emniyetî û çi jî ji riya êrîşa çandî û jînosayda lawan û şerê tiryakê û wêrankirina aboriyê û şeqkirina civaka Kurdistanê û …hwd û bi dehan û sedan riyên din bikare serkevtuina dawî bi ser Kurdistanê de ragehîne. Bo rejîma Komara Îslamî xaleke guhertinê û "heysiyetî" bûye ku bikarin îradeya xweragiriyê di Kurdistanê de têk bişkînin. Heta ew kêmasî û kêşeyên civakî û siyasî û aborî jî ku di nava Kurdistanê de hene, bi sedan hember zeq kirine, da ku derûna neteweya Kurd têk bişkîne.

Lê neteweya Kurd û xortên vî gelî ji riyên cur bi cur ve ya ku ji dest wan hat kirine, da ku bi hejmoniya Komara Îslamî bilîzin û henekên xwe pê bikin.

Ji mana xortên fîdakar ên gel ve, li ser çiyayên serkêş ên Kurdistanê ve bigre heya ku pêşkêşkirina rûpelekê bi zimanê Kurdî bi cemedaniyê ve bi takên civakê, ew riyên berfireh bûn ku neteweya Kurd gote vê rejîmê "Na".

Serkevtina leşkerî serkevtineke rastîn û dawî nine, her wekî ku neteweya Kurd selimandiye ku

## Mistefa Hicrî: Kurdistana Rojhilat, ji bo serhildanê amade ye



**Bûyerên niha yên di deverê de, wisa nîşan didin ku rengê despêkirina şer heye û partiyên opozîsiyon yên Kurdistana Îranê jî, berfirehtir xebat dikin.**

Mistefa Hicrî, Lêpirsyarê giştî yê PDKÎ, di gotûbêja di gel kanala "Dengê Amerîkayê", derheq dawîn bûyerên deverê bas ji vê kir ku, bizav û helwêst wisa nîşan didin ku rengê despêkirina şer di deverê de heye.

Hicrî di vê gotûbêja xwe de bas ji hindê kir ku, dewleta Amerîka, bi taybet "Trump" û rêberê rêjîma Îranê, Elî Xamne`î, ragihandibûn ku naxwazin şer bikin; lê, meydan bo şer heye.

Navbirî di bersiva wê pirsa ku Amerîkayê hemû hewlên wê eve ku Îran reftarên xwe biguher e, gelo ma Îran reftarên xwe diguhere? basa wê kir: Ewa ku me heya niha li Îranê dîtiye, belê Îran reftarên xwe di jêr gef û metirsiyan de diguhere, dema tirs ji guhirîna hikûmetê tê gorê û hekî bizanbin hikûmeta wan ber bi herifînê, zû diçine ser maseya gotûbêj, di lihevkirina Bercamê de, ev rêjîm piştî 10 salan ji baykutên aborî, asta aboriya Îranê gihandiye niqta sifir, û Îranê jî, serê xwe ber mercên Ewropayê çemand.

Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ, di vê gotûbêjê de bas ji hindê dike ku: Hemû hewlên me tev opozîsiyona Îranê ewa ye ku, rewşa bi hevhatin û ji hev nêzîk bûnê bigirine pêş xwe. Hevdem opozîsiyoneke bêserûbere û programek xûya nîne û ev jî bûye sedema nerazîbûnên xelkê, ku, nekarîne bikevine qalibeke rêxistîtir de.

Hicrî di vê gotûbêjê de bas kiriye, me di sala 1395`an de, xebatek nû bi navê Rasan ku çend alî û çend qonaxe, li Kurdistana Îranê destpê kiriye û piştre me tev partiyên Kurdistana Îranê, navenda alîkariyê pêk aniye û xebat kirin li dijî rejîma Îranê.

Her di vê derheqê de ku Kurd li Kurdistana Îranê di astekê de ye ku, amadeyê serhildanê ye, bas ji vê yekê kir ku, Kurdistana Rojhilat pitir ji parçên din, amadehî bo serhildanê heye û niha jî amadebûneke zêdetir heye, ew jî weke deb û nerîtên me yên dîrokî hemû demên partiyên opozîsiyonê xebata hebûye, xelk jî siyasîtir û rêxiravtire, û ji ber vê yekê jî, xelk amadehyeke pitir heye bo serhildanê û rêjîma Îranê jî vê rastiyê dizane ku Kurdistan amadeye bo serhildanê.

Di dawiya gotûbêjê de, di bersiva vê pirsa ku peyama ve bo kirêgirtiyan ku li dijî ve şer dikin çiye: Hicrî bas ji vê kir, me berê jî peyam ji wan welatiyan re daye, ku niha rêjîma Îranê ber bi herifînê diçe, pişta rêjîmê berdin û çeka wan danên erdê.

# Dezgeha Perwerde û Lêkolînê ya PDKÎ civînek lidar xist

Dezgeha Perwerde û Lêkolîna PDKÎ li kempa Cejnîkanê civînek bo Luqman Mêhfer endamê Heyeta Birêveberiya Navenda Siyasî yê PDKÎ lidarxist.

Di berdewamiya karê Dezgeha Perwerde û Lêkolîna PDKÎ, bi boneya bilindbûna asta siyasî ya pêşmerge û endamên hizbê, vê dezgehê civînek bo beşek ji pêşmerge û endamên hizbê li kempa Cejnîkanê birêve bir.

Di vê civînê de, Luqman Mêhfer endamê heyeta Birêveberî yê Navenda Siyasî wiha axavt ku: Kurd çava derheq maf, ji mafê neteweybûnê hatiye bêparkirin?

Navbirî di beşeke din a axavtinên xwe de, axavtineke kurt derheq dîroka Kurd axavt û piştire di berdewamiya axavtina xwe de, derheq mafê navdewletî axavt û ev mafê neteweîbûnê şirove kir, ku Kurd jê hatiye bêparkirin, û herwisa bas ji biryarname û peymanameyan kir li hemberî Kurd berê ji aliyê xwedî hêzan ve,hatiye pesendkirin.

Luqman Mêhfer, di vê civînê de bas ji rûla PDKÎ kir ku wekî, hêzeke ku biawayekî hertimî giringiyeke taybet bi pirsa neteweyî daye.

Di dawiyê de wiha axavit ku, Rasana Rojhilat wekî berdewamkirina vê siyaseta neguherî ya PDKÎ ye, û hewl bo bidestveanîna mafê netewayîbûnêî li Rojihilata Kurdistanê dide.



Di dawiya axavtinên navbirî de, amadebûyan raman û nerînên xwe anîn ziman û bersiva pirsên hatinî gore, ji aliyê Luqman Mêhfer hatine dan û wiha dawî bi vê civînê hat.

# Civînek derheq çavaniya bikaranîna torên civakî hate lidarxistin



Dezgeha Perwerde û Lêkolînê ya PDKÎ, civînek derheq çavaniya bikaranîna torên civakî lidar xist.

Roja Çarşemî 24`ê Banemera 1398`an, Dezgeha Perwerde û Lêkolînê ya PDKÎ, di çarçêveya kar û çalakiyên xwe de, civînek bo “Mihemed Sahibî” berpirsê Dezgeha Ewlehiyê yê PDKÎ, pêk anî.

“Mihemed Sahibî” di vê civînê de basek tijî derheq mijarên han pêşkêş kir:

- Çavaniya bikaranîna torên civakî û zêdekirina asta zanyariyan di vê derheqê de.

- Xatircembûn li wan mobaîlên ku bikartînin û ji van “Aplication”ên ku dadinên.

- Agehdarbûn û nekevtina nav dafikên rejîma Îranê ku, li nav torên civakî yên wekî Facebook û … hwd, ku merema wan afirandina alozî û mijûlkirina takan jixwe digire.

-Çavaniya rûbirûbûna li-hemberî pîlanên dijmin yên derheq afirandana şerê derûnî ku li dijî me bikar tîne.

Herwisa navbirî, çendîn pirsên giring yên derheq torên civakî pêşkêşî amadebûyan kir.

Piştire, amadebûyên civînê, nerîn û ramanên xwe yên di vê derheqê de pirskirin û di dawiya civînê de jî, bersiva pirsiyarên amadebûyan ji aliyê “Mihemed Sahibî” hate dan û şirovekirineke zêde derheq ramanên amadebûyên hate kirin û civîn dewlemendtir kir.

# Encûmena Nîştimanî ya Kurd digel nûneratiya Partiya Demokrat civiya

Emcûmena Nîştimanî ya Kurdistana Sûriyê, serdana binkeya nûneratiya PDKÎ li Hewlêrê kir.



Rêkefta 19`ê Banemera 1398`an(9`ê Gulana 2019`an), şandeke Encûmena Nîştimanî ya Kurdistana Sûriyê, bi serperestiya Nevaf Reşîd serokê nûneratiya “ENKS” serdana binkeya nûneratiya PDKÎ li Hewlêrê kir, û ji aliyê “Mihemedsalih Qadirî beripirsê pêwendiyên Kurdistanî yê PDKÎ pêşwazî ji van hate kirin.

Serokê nûneratiya Encûmena Kurd li Sûriyê, Nevaf Reşîd, tevî bilindragirtina xebata neteweyî ya Partiya Demokrat û nîşandana keyfxweşiya xwe di vê hevdîtinê de, derheq rewşa Kurd li Kurdistana Rojava û rewşa xebata vê parça Kurdistan axavt û hevdem pirsa Sûriyê û helwêsta aliyên navneteweyî û dever û dîtingeha Encûmena Nîştimanî di vê pêwendiyê de, anîne ber bas.

Di berdewamiya vê civînê de, berpirsê pêwendiyên Kurdistanî yê PDKÎ, Mihemedsalih Qadirî derheq helwêst û dîtingeha aliyên navneteweyî û deverê li hemberî pirsa Kurd û rewşa Rojhilata Navîn û guherînkariyan, îşare bi siyaset û kiriyarên têkderane yên rejîma Îslamî ya Îran û Spaha Pasdaran a terorîstî ya vê rejîmê derheq dever û cîhan, bi taybet pirsa Kurd di hemû parçên Kurdistan û dawîn pêşhatên deverê kir, û herwisa helwêst û siyaseta PDKÎ derheq hemû pirsên ku hatine gorê anî ber bas.

Civîna di navbera her du aliyên Şanda Encûmena Nîştimanî ya Kurdistana Sûriyê û PDKÎ, derheq pêdagîrîkirina li ser pirensîpên navneteweyî û piştevanîkirin li xebatê di her yek ji parçên Kurdistanê de, axavtin.

# Nobedarî




N: Bûbê Eser

Ez roja ji vê zîndanê derketim, û heta niha her ku ez an hinên din behsa wir dikin, tirseke dikeve dilê min de, pora serê min gij dibe, û şermeke bê hempa min digire.

Di wê zîndanê de, nêzîkî deh hezar, şoreşger, welatparêz, karker û gundî hatin û çûn. Em bêjin wan karger û gundiyan nikarîbûn, an ji wan nedihat ku ew, wan kerasetên di wê zîndanê de dianîn serê me welatparêzên kurd binivîsînin.

Lê heyfa min tê li wê heyfê ku gelek rêvebir, serok û kadirên patiyan ên zîrek jî hebûn. Piraniya wan xwenda bûn, hin ji wan nivîskar bûne, rewşenbîr bûne, û hin jî piştî berdana xwe dîsa ketin nava siyasetê. Lê mixabin û hezar car mixabin, wan qehremanana, wan egîdan bi helwestên xwe, bi xwedî biryar û tevgerên xwe, her ber xwe dan, xwe bi temamî radestî dijmin nekirin.

Erê her çiqasî xwe radestî dijmin nekirin jî, lê dema ji wê zîndanê derketin, nehat bîra wan ku di wir de kurdî qedexe bû. Yanî dijmin, zimanê me li me qedexe kiribûn. Şerm û qebehata herî mezin ew bû ku piştî berdana xwe, gelek ji wan kesên min li jor bi nav kirin, êdî wan kurdî li xwe qedexe kirin. Rojekê û carekê nehat bîra wan ku bêjin: ”Di wê zîndanê de kurdî li me qexe kiribûn, da ku em jî niha tirkî li xwe qedexe bikin.” Nekirin, nakin û hê jî hema hema temamên wan kesana karên xwe, nivîsên xwe, siyaseta kurdî bi tirkî dikin.



Bi tirkî gazî dagirkeran dikin û dibêjin: ”Qedexeyên li ser zimanê me rakin”. Bi tirkî romanan dinivîsînin û mijara wê romanê li ser zîndanê ye. Çîrokan bi tirkî dinivîsînin û mijarên wan gelek li ser wê zîndanê ne.

Piraniya rewşenbîrên me êdî nema dikarin dev ji zimanê tirkî berdin, ji ber ku ew ziman bi wan şêrîn e. Ew ziman bi wan delal e. Wî zimanê bi wan îşkence dihate kirin, niha ji dêlva zimanê xwe, wê xurt dikin,Ji ber ku ew ziman ketiye nav xwîna wan de, loma nikarin dev jê berdin.

Garidyan digot:
Di dema nobedariyê de bi hinan re axaftin, razan, rûniştin qedexe bû. Bi kurtasî mirov dikare weha bêje ku tenê nobedarê girtî, di dema nobedariya xwe de li ser niga dikarîbû bigeriya. Wî nikarîbû li gel kesî têkilî daniya, nikarîbû tişt bida û bistanda. Eger yek ji me, em bihatana û tişt ji nobederê girtî bixwesta jî, pêwîst bû ku wan neda. Ji bona ku em ji van tiştên xwe bawer bin, gelek caran me nobedarên girtî diceribandin. Car-carna jî yuzbaşî xwe dikir weke nobedarekî leşker yên şevê û kincên wan li xwe dikir, li qawişan digeriya ku bê hela nobedariya şevê çawa derbas dibe. Ji bona ku kesek şaşitiya nekin, me gelek tişt dianî serê wan.

Şevekê ez û çend hevalên gardiyan, em nobedarên saet 01.00 - 03.00an bûn, em ji xwe re li hundirê girtîgehê digeriyan. Lê ew ger bi xwe jî, ji me re xweş nedihat. Ji ber ku em fêrî rehetiyê û serbestiyê bû bûn. Loma em aciz dibûn, ji bo ku em acizbûna xwe derbas bikin, pêwîst bû me ji xwe re karek bidîta. Dema em di salona bloka D-yê de derbas bûn û em hatin ber qawişa (....) (Gardiyan nedixwest ku nav û nimrên qawişa bide her gav dema dihat ser nav û nimra, wî digot felan kes û filan qawiş) hevalekî got:
-Hevalno ka em binerin bê hela nobedarê vê qawişê çi dike, çawa nobedariya xwe digire. Eger her tiştê wî nîzamî be jî, divê em tiştekî din bîne serê wî.
Hevalekî din got:
-Çawa, em ê çi bînin serê wî?
-Em tiştekî weha bînin serî wî ku ew xwe şaş bike. Yekî din got:
-Çawa?
-Binerin, em ê çar kes di wan qulikên di şibakên di dîwêr de ne, li hundir qawişê binerin. (Di dîwarên qawişan de hin şibake hebûn, stara şibaka ji hesin çêkiribûn, di wan staran da yanî di kapaxan de jî çar qulik hebûn, dema ew sitar yanî kapaxa şibakê dihate girtin, ew mirovên di hundir qawişê de yên derve nedidîtin, lê ew kesên li derve dikarîbûn xweş li kesên di hundir de mezê bikirana. Ji xwe derdê girtiyan yê hey giran jî, yek ji ber wan qulikên di şibakan de bûn. Ji ber ku ew her dem di wir de dihatin kontrolkirin. Gelek tiştên wan bi saya serê wan qulan dikete destê me) Em ê dudu jî herin ber derî, eger me nobedar bi sucekî girt, ji xwe ne pêwîst e, lê na her tiştên wî nîzamî be, wê demê ez ê avê ji wî bixwazim, dema ku neda ez ê li ber wî bigerim, zikê wî bi xwe bişewitînim, ez ê weha bikim ku ew avê bide min. Ji xwe dema wî av dirêjî min kir, serê sibê wê çi bê serê wî diyar e.

Me gişa bi hev re got:
-Wele ev ne fikireke xerab e, ji xwe em acizin, da ka em vê jî biceribînin.

Di wê qawişê de çar şibake hebûn ji me çar kesan xwe dane ber şibakan û li hundir mezê kirin, du kes ji me çûn ber derî. Nobedarê girtî, nobedariya xwe nîzamî digirt, tu qusura wî jî tunebû. Dema ku şibaka di derî de vebû, wî baz da hat, qederê metrekê xwe dûrî derî girt, berê silava niga, dûre ya serî da û got:
- Ez, S.A. nobedarê saet 01.00 - 03.00an, qawişa me ji 52 kesan pêk tê, di towaletê de tu kes tune ye û herkes razaye, tu vuqûat jî tune ye komûtanê min!
Ji xwe her kesekî girtî baş fêrî komûtdanê û nîzamî

»»»Dom R:5

»»» **Doma R: 4**

nobet girtinê bûbûn. Hevalê gardiyan berê li wî mezê kir û got:
-Biner ez jî weke te nobedarê vê sa`etê me, ji te û min pêve tu kesekî şiyar tune ye. Ez gelekî tî bûme, eger tu bikaribe qedehek av bide min, ez ê gelekî kêf xweş bibim.
Nobedarê girtî got:
-Komûtanê min emrê te li ser çav û serê min, lê weke tu jî dizane ku dan û stendina tiştan di dema nobedariyê de qedexe ye, ez nikarim vê daxwaza te pêk bînim.

Piştî vê bersîvdana nobedarê girtî, ew hevalê me yê gardiyan, gelek şeytaniyên wî hebûn. Car-caran ew weha diaxifî, ku mirov di bin bandora axaftinên xwe de dihişt. Ji xwe ew bi vî awayî bûbû gardiyanê girtîgehê. Wî bi awayekî dilşewatî axaftina xwe domand:
-Bi rastî ez gelekî tî bûme, ger tu qedehek av bidî min, ez ji tu kesî re nabêjim.
-Na komandanê min na, ez nikarim bidim.

Lê carakê wî xistibû serê xwe ku tiştekî bîne serê nobedarê girtî û got:
-Bi rastî gelekî tî bûme, ez soz didim te ku ez ê ji tu kesî re nebêjim, ev tenê, wê di nava min û te de bimîne. Û hin fen û fûtên din kir, wer kir ku bi rastî zikê nobedarê girtî bi wî şewitî.

Ji xwe, ew mirovên girtî, mirovên gelek qenc û baş bûn, wan tu carî xerabiya kesên qenc nedixwestin û wan her car dixwestin alîkariya kesên ku pêwîstiya wan ji alîkariyê re hene bikin. Lê me ev yeka wê demê nizanîbû. Loma nobedarê girtî got:
-Bi rastî ev ê di nava me de bimîne?
-Belê, belê.

-Baş e, ez ji te re qedehek av bînim. Got û çû qedehek av anî û dirêjî gardiyan kir, dema gardiyan av girt destê xwe hema weha avît ser çavê wî û got:
-Min .....te, ez ê serê sibê çi bînim serê te, tê bibîne, ker kurê keran, ma tu nizane ku di dema nobedariyê de her tişt qedexe ye. Me şibake bi hêrs girt û em çûn.

Me ji xwe re lîstikek nuh derxistibû, lîstikên weha li ba me pir bûn. Wan mirovên girtî gelek caran diketin dafikên ku me li ber wan vedidan. Ev nobedar jî yek ji wan bû. Wî bi xwe nema dizanîbû ku serê sibê wê çi bête serê wî.

Serê sibê me ew kiryara xwe ji hemû gardiyanan re got. Loma jî sibê zû, di dema derxistina qarewanan de em qederê 10-15 gardiyan ketin hundirê wê qawişê û wî gardiyanê me î fenek ku ew kes xapandibû qêrîya:
-Nobedarê saet 01.00 - 03.00 ê, ku av dabû gardiyan bila derkeve.


Bi xelasbûna gotina wî, ew kes, ew reben, ew mirovperwer, sê gav avête pêş û komuta xwe da:-"S.A. Mêrdîn emir bike komandanê min! Em weke gurê har û birçî li dor wî civîyan, gardiyanê ku ew xistibû vê dafikê, gelekî bikêf bû, ji ber ku wî nêçirek bi destxistibû. Loma serê wî bilind bû, destê xwe da paş qûna xwe, bi awayekî devliken got:
-Hooo hevwelatiyê min tu çawa ye? Naxwe te av da min ha, ji dêlva avê te karîbû tiştekî din jî bida lo.
Bi xelaskirina gotina xwe, wî weha kulmek lê xist, girtî ket û ranebû. Bi ketina wî kesî, kêfa me gişan hatibû, loma gardiyanê li wî da, keniya û got:
-Hela rabe, rabe tu îro bi vî awayî, nikare ji nava destên min xilas bibe.

Di dema rabûna girtî de, îcar Sergardiyanê me yek lêda, berî ku ew bikeve erdê me hemûyan êrîşî ser wî kir, te digot qey, mişkek e ketiye nav lepên 10 pisîkan, me jî li wî weha kir. Me yekî ew bi lêdanê diavît ba yekî din. Te digot qey em bi topê dilîzîn. Qêrîn û warîna wî diçû ezmana, hevalên wî yên girtî hemûyan weha li me mezê dikirin, lê wan nikarîbûn hevalê xwe ji nav destên me xilas bikin. Kesekî newêrîbû dengê xwe derxe. Me lêdana xwe domand heta ku ew ket û ranebû, lê bi rastî me nizanîbû ku ew mir an ji xwe derbas bû, ji ber ku her tişt ji bo me serbest bûn. Me dikarîbû, mirov di vir de bikuşta ku kesekî nikarîbû tiştek bi me bikira. Em tu carî ji mirin an jî seqetbûna girtiyan neditirsiyan, ew dijmin bûn, ji bo lêdana wan em bi her awayî azad bûn.

Piştî ku girtî ket û ranebû, dilê me kete cih, me dizanî bû êdî kesekî din, wê weke wî neke. Berî derketina me, gardiyanê qawişa wan xwest ku mêraniya xwe nîşanî girtiyên qawişa xwe bide, loma wî bi hêrs got:
-Qawiş!
Hemûyan bi hev re gotin:
-Emir bike komûtanê me.

-Divê hûn sê rojan xwarinê nedin vî kesî ku ev sûçê giran anî ser qawişa we, baş e. Hemûyan dîsa bi hev re gotin:
-Tu emir bike komûtanê me. Ew emirê ku ji aliyê me de dihat dayîn, pêk dihat. Eger hin caran girtiyan gelekî bi dizî bi ya me nekirana jî, bi piranî tiştên me digot pêk dihatin. Ji ber ku wan baş dizanîbûn, ew her dem di bin çavan de ne û tên kontrolkirin. Wan em nedidîtin lê me ew baş didîtin. Eger tiştên ku ji aliyê me de nehata dîtin hebana, bi saya serê wan muxbîran, li kîjan qawişê çi biqewimiya ji mere dihat gotin. Me di her qawişê de hevalbendên xwe, yanî muxbir dabûn çêkirin, bi saya serê wan ew tiştên di qawişan de li dijî emirên me dihatin, an jî axaftinên hin kesên ku hîn nehatibûn rê, ji me re dihat gotin

# Dayîka sê şehîdên sorxelat çû ber dilovaniya xwe



Dayîka 3`ê şehîdên rêya rizgariya Kurdistanê, li bajarê Sine çû ber dilovaniya xwe.

Roja Duşemî 30`ê Banemera 1398`an(20`ê Golana 2019`an), Gevher Sadiqî dayîka sê şehîdên sorxelat yê PDKÎ yên bi navên "Ebas, Şehriyar û Şapûr Serî`etî" li bajarê Sine koça dawiyê kir.

Şehîd Ebas Şerî`etî kadrê komîteya şaristaniya Sine, li rêkxistina devera Hisênava, li sala 1336`an li bajarê Sine jidayîk bûye, û navbirî li şer û peçûna li hemberî hêzên dagîrkar yên rejîma Îranê, li rêkefta 29`ê Gelawêja sala 1362`an, digel hevalekî din yê xwe li devera Gaveroyê li gundê Mîravaya Remişt, tevlî karvana şehîdên Kurdistanê bû.

Şehîd Şehriyar Şerî`etî, teşkîlata veşartî di nav bajar de bû, ku ji aliyê rejîmê ve li rêkefta 15`ê Xermanana 1367`an, li bajarê Sine hate bidarvekirin.

Şehîd Şapûr Şerî`etî, kadrê komîteya bajarê Sine li teşkîlatê di nav bajarê Sine, li rêkefta 17`ê Sermaweza sala 1369`an, digel çend endamên veşartî yên din li bajarê Sine, ji aliyê rejîma cinayetkar ya Îranê, hatine desteserkirin û piştre bidar vekirin.

Termê xwedêjêrazî Gevher di nav girseya xelkê bajarê Sine û deverê bi axê hate spartin.

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, tevî nîşandana nerhetbûna xwe derheq koça dawiyê ya xwedêjêrazî, sersaxiyê dibêje, malbat, xizm û kesûkarên navbirî û xwe şirîkê vê xema van dizane.

# Pirsgirêkên li pêşberî çapemeniyê li Kurdistana Rojhilat û Îranê



N: Eskender Ce`iferî

Dayîn û standina zanyariyan li Îranê û Kurdistana Rojhilat, kontrolkirî û qedexe ne. Dibe ku rojnamevanek ji ber belavkirina nûçeya girtina kesekî yan jî zanyariyên li ser darvekirina kesekî, bi salan bê girtin.

Li wir fîltera zanyariyan heye ku di vê di berjewendiya rejîmê de bin. Li gor benda 12'an a Danezana Gerdûnî a Mafên Mirovan ku ji aliye Neteweyên Yekbûyî ve di 10'ê Berfanbara 1948'an de hate pejirandin, ti kesek nabe ji ber sedemên weke jiyana arizî, malbat xanî an jî ragihandinê, rastî ziyanê bê. Li vî welatî, qet ne Zertiştiyan ne Behayiyan û ne jî Yarsanan mafê derxistina tenê belavokekê jî nîn in.

Ev jî yasayên exlaq û azadiyan binpê dike ku li gor wê, mafê her kesî yê azadiya ji bo raman, wijdan û olê heye. Eger jî di asta cîhanî de tê gotin ku mafê her mirovî heye ku bi serbestî beşdarî jiyana çandî a civakî be, lê li Îranê eger ew mirov girêdayî ola Îslamê nebe, jê re pir dijwar çê dibe ku beşdarî karûbarên ragihandinî û çapemeniyê bibe.

Li gor benda 731'an a Yasaya Cezayên Îslamî li Îranê, divê tevahiya rojname, malper yan ragihandinan bikarin zanyariyan li dijî hikûmetekê belav bikin. Lewre divê li gor wan yasayan, partî û aliyên dijberên rejîma Komara Îslamî bikarin lidijî rejîmê mifahê ji wan zanyariyan bistînin. Lê wê demê ew malper yan sazî tê cezakirin ku wan zanyariyan belav dike. Kesê ku bi vê tometê tê darezandin bi dayîna pere ji şeş milyon Tumenan heya çendîn salan girtinê tê cezakirin. Herwisa bendên 747 û 748'an ên yasaya navbirî, amaje dikin ku eger kesê tometbar bi belavkirina zanyariyên li dijî hikûmetê, karmendê dewletê be, dibe ku tevî dûrxistina wî ji kar, rastî girtinê yan jî derbeyên qamçoyê bê.

Tevahiya saziyên ragihandinê ên çapkirî li Îranê, çi ên dewletê û çi jî ên dervey desthilatê, divê derfeta çalakiyê ji wezareta Çanda Îslamî bistînin. Ew di dema standina derfetê de hin belgeyan îmze dikin ku têde amaje dike daxwazker nabe ti çalakiyekê li dijî hikûmetê encam bidin ku bikare di berjewendiya partiyên dijber de be.

Li Îranê tenê dewlet dikare xwediya televizyonan be. Xelk yan xwediyên sermayeyan jî dikarin çend demjimêran ji bo programekê ji xwe re bikirin. Lê mafê wan ê avakirina TV û radyoyan tine ye. Ew tenê dikarin belavokan bi standina derfetê ji dewletê çap bikin. Mehdî Kerûbî berendamê serokkomariya çend gerran beriya niha, Elî Muteherî parlamenter û hin kesên din dixwastin derfeta avakirina radyo û televizyonê bistînin. Lê tevahiya wan daxwaziyan hatine redkirin.




Sedem jî ev e ku rêveberiya saziya televizyonan a vî welatî ku weke Deng û Rengê Komara Îslamî tê binavkirin, di bin çavdêriya rasterast a Elî Xamineyî rêberê Komara Îslamî de ye. Bi vî rengî jî li Îranê û Kurdistana Rojhilat, tenê Xamineyî xwediyê radyo û televizyonan e. Ew ragihandinkar û rojnameyên ku li gor yasayên rejîma Îranê, binpêkarî encam dane, di yek ji van sê dadgehan de wê bêne dadgehîkirin: Eger rêveberên saziyan li hemberî wan gilî kiribin, li Dadgeha Çapemeniyê têne darezandin.

Eger li gor ku ew dibêjin, tevlîhevî di ewlehiya netewî de çê kiribe, li Dadgeha Çand û Ragihandinê têne darezandin. Eger jî Xumeynî avakerê rejîma Komara Îslamî yan jî Elî Xamineyî rêberê niha ê vê rejîmê rexne kiribin, li Dadgeha Şoreşa Îslamî têne darezandin. Sedem jî ew e ku mafê kesî nîn e wan du kesan rexne bike.

# Endamekî PDKÎ bi sedema qezaya tirafîkê canê xwe jidest da

**Di qezaya tirafîkê de endamekî PDKÎ li Geliyê Xiruşo ya li herêma Deştebilê canê xwe jidest da.**

Li gorî nûçeya ku gihîştiye malpera "Kurdistanmedia"yê, roja Sêşemî 23`ê Banemera 1398`an, endamekî PDKÎ yê bi navê "Xelîl Ebdî" yê temen 52 salî û kurê Ebdulla bi sedema qezaya tirafîkê li Gelî Xiruşo ya girêdaiy herêma Deştebêlê canê xwe jidest da.
Xwedêjêrazî li sala 1368`an bi hegera endambûn di PDKÎ de û xebata rêkxistiniya vê partiyê de, ji aliyê hêzên îtila`atê ve hatibû desteserkirin û bo heyama 18 mehan di girtîgehê de derbaskiriye û piştire hatibû azadkirin, xwedêjêrazî emegnasê rêbaza şehîdan bû û xebata xwe berdewam dikir da ku dîsan, li sala 1373`an ji aliyê îtila`ata rejîmê ve hate desteserkirin û rastî gellek lêdan û êş û azaran hatibû, lê, navbirî her berxwedarbû, û bo heyama 5 salan di girtîgehê de derbaskir û piştre hate azadkirin, û dîsan wekî berê rêbaza xwe berdewam kir.

Xwedêjêrazî xwediyê malbateke nîştimanperwer bû, û her di vê pêwendiyê de jî, birazayê navbirî ku pêşmergeyê PDKÎ bû, yê bi navê "Şaxewan Ebdî" sala borî di gel komek hevalên xwe di şer û pevçûnekê digel rejîma terorîsata Îranê li çiyayên Kêleşînê hatine şehîdkirin.



Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, sersaxiyê dibêje xizim, kesûkar û malbatên wî û xwe pişkdarê vê xema wan dizane.

## Nerîna Lîderan



**Mistefa Hicrî:**

**“Kurdistana Rojhilat, ji bo serhildanê amade ye”.**



**Donald Trump:**

**“Hekî rejîma Îranê kiryareke terorîstî li dijî hêzên Amerîkayê encam bide, wê rastî şaşitiyeke mezin bê”.**



**Vladimir Putin:**

**“Em nikarin hemû pirsgirikîn Îranê çareser bikin, em wezîfedarên vemirandina agir nînin.”**



**Cawad Zerîf:**

**“Trump, dixwaze karekî encam bide ku, Eskenderê mezin jî nekarî bike”.**

# Avabûna stêrka bextê rejîmê



N: Dara Natiq




Weke diyar e ku Îran li hember guhartinek grîng û dîrokî de ye. Siyaset û stratêjiya dewleta Tiramp yê seromarê Amerîkayê li hember rejîma Îranê di yek sala borî heya niha, gav bi gav hatine piraktîzekirin û rejîma Îslamî a Îranê bi kirîzek bingehîn a abûrî,siyasî û leşkerî re rûbirû kiriye. Dorpêçên Amrîkayê derheq hinardekirina neft û gaz, pîşesaziya pitroşîmî û tev liv û bizavek abûrî a wî welatî û heya wekî terorîstnasandina hêza leşkerî a wî welatî û gellek gavên din yên li dij vê nîzama dîktator, destpêka herifîn û ji holê rakirina text û bextê vê rejîma dijîmirovî û xwedî derbasbûyek tejî ji cinayet û teror, bileztir kiriye.

Di qonaxa niha de, Amrîka li gor hêz û şiyana xwe ya bihêz di asta cîhanî de, hewil dide ku bi bikaranîna tev amrazên weke şerê derûnî, ragehandin, abûrî, serbazî, siyasî û dîplomasî bi awayekî berfireh, rejîma Îranê bi çok de bîne, û rapêçî ser maseya gotûbêjê bike. Lê ya xuya ye, ku heya niha siyaset û dijkiryarên rejîma Îranê li hember dewleta Amrîkayê ji gefan zêdetir tu gavek piraktîk bi dû re nebûye, û heya dost û hevpeymanên wê yên weke Çîn û Rûsiye jî amade nînin bi hewarê de biçin. Siyaset û stratêjiya Îranê cuda ji mifahwergirtin ji hêzên tundrew û yan jî şerê niyabetî li her eger û pêşhatekê de, çêkirina nakokî û şeqkirina navbera Amrîka û dewletên Ewropa de ye, û ji aliyekî din ve jî pêşgirtina siyaseta bi navê sebr û tehemula stratêjîk e. Bi vê wateyê ku Îran dixwaze bi kirîna demê û li benda tewawbûna gera serkomariya Tiramp û hilbijartina kesekî ser bi “Partiya Demokrat”, bergirîkirin li hember zext û sizayên abûrî, çavnihêrî kirin ji bo mandîbûn û paşvekêşiyana Tiramp û egera guherîna siyaseta navbirî, wê rewş û zirûfa han derbas bike.

Pêbendnebûna Îranê bi çend madeyek ji rêkewtina etomî a bi navê “BERCAM”, hewleke rejîmê ye ji bo çêkirina dirz û valahiyan di navbera Amrîka û dewletên Ewropî de. Bi vê wateyê ku Îran dixwaze ji tirs û nigeraniya dewletên Ewropî derheq pirograma Etomî a rejîmê, ji bo kêmkirina sizayên ser wî welatî mifahê werbigre, û demê bi qazanc û berjewendiyên xwe bistîne. Lê rejîma Îranê baş dizane ku pabendbûn bi tev bendên rêkewtinameya etomî a bi navê “BERCAM”ê, gerentiya sereke a piştgîrî kirina dewletên weke Ewropa, Rûsiye û Çînê ye li hember egera êrîşa nîzamî a Amrîkayê bo ser Îranê. Ji ber ku berevajî siyaseta Ewropayiyan, Amrîka li vê yekê bihêcet e, û dixwaze ku Îran li rêkewtinameya “BERCAM derkewe, û vê demê yê bi alîkariya hevpeymanên xwe yên herêmî yan dê êrîşek leşkerî bike ser Îranê û yan jî dê Îranê neçar bike ku rêkewtinameyeke giştgîr bi qebûlkirina tev mercên dewleta Tiramp ku ew jî bi wateya şikest û betalbûna felsefe û naveroka rejîma Îslamî a Îranê ye îmza bike.

Di rastî de, di vê rewş û zirûfa han de, her liv û şaşiyek ji aliyê rejîma Îranê û saziyên tundajo yên girêdayî vê rejîmê ve, wê bibe sedema şer û pevçûn di navbera Amrîka û Îranê de, û vê demê yê şerekî mezin û giştgîr di asta herêmî de li dijî Îranê dest pê bike. Lê heya niha Amrîka dixwaze ku Îran bi şert û mercên wan razî bibe û bi hatna ser maseya gotûbêjê, rêkewtinameyek nû bi hev re îmze bikin.

Ya ku heya niha diyar û dixûye ku Îran tenê du rêk li pêşiyê de ne, yan dibe şer bike yan jî dibe bi qebûlkirina tev şert û mercên heyî, were ser mîzê gotûbêjê, ku di herdu rewşan de rejîm bi şikestê re rûbibû dibe, û tiştek bi navê rejîma Îslamî a Îranê namîne. Destpêka herifîna rejîma dîktator a Îranê dest pê kiriye, û stêrka bextê vê rejîmê ber bi avabûnê ve diçe. Bizava azadîxwazî a Îranê bi giştî û bizava rizgarîxwaz a Kurdistanê bi taybetî dibe xwe ji bo guhartinên grîng û dîrokî di Îranê de berhev bikin. Xebatek berfireh û çendalî li hember vê nîzama xwînmij û zordar, gavek lazim û bilez e. Hewce ye ku bizava azadîxwazî a Kurdistanê bi xebateke giştgîr a siyasî, dîplomasî û leşkerî, wek hêzeke bi bandor di qada xebat û tekoşînê de liv û bizavên xwe bigurtir bike.

# Şorişa Ziman û berpirsyariya me



N: Azad Kurdî




Ziman wekî yek ji koleke û xalên serekî ye di nasnameya her gelekê de. Ji roja ku ziman çê bûne heta îro, hemû neteweyan hewl dane û didin ku girîngiyeke taybet bidin parastin û pêşdebirina zimanê xwe. Ji ber ku gelek ku bê ziman be, bê nasname ye jî.

Dema mirov li welatên demokratîk û pêşketî yên cîhanê digere, yek ji xalên berçav ku zû ber çavan derbas dibe, xala parastina zimanê wan e. Hemû ew dewlet girîngiyeke taybet di jiyankirina zimanê xwe û bihêzkirin û pêşvebirina ezmanê xwe yê neteweyî. Li welatên çend netewe û çend ziman weke Beljîka û Swîsra li Ewropayê, ji ber hebûna çend ziman û neteweyan di çarçoveya wan dewletên federal de, ev yek gellek berçav û diyar e. Lê cudahî û ferqeke ji sedî sed heye di navbera Beljîka û Swîsra de ligel welatên weke Îran, Turkiye û Sûriye ku zimanên gelan qedexe kirinû yek ziman ser wan ferz dikin, ev yek e ku di qanûnên bingehîn ên wan welatan de hemû mafên xwendin, nivîsîn û perwerdekirin bi zimanê her yek ji wan neteweyan wekhev e û bê ferq û cudahî di hermû warên jiyanê de, nemaze di warê perwerdeyê de. Mixabin dewletên dîktatûr ên ku Kurdistan di navbera wan de hatiye dabeşkirin, ji hemû taybetmendiyên demokratîk û mirovahiyê betal û dûr in.

Kurd gelê herî mezin ê cîhanê ye ku bê dewlet e. Gelê kurd li Rojhelata Navîn bi sedan salan e ji mafê perwerde û xwendin û nivîsîn bi zimanê xwe yê neteweyî hatiye bêparkirin. Ji xeynî Başûrê Kurdistanê, niha jî be li Turkiye, Îran û Sûriye zimanê kurdî ji kurdan hatiye qedexekirin û zarokên kurdan neçar in ji destpêka xwendinê heta dawiyê bi zimanên Turkî, Farsî û Erebî bixwînin û binivîsin û perwerde bibin.

Siyasetek bi navê asîmîlasiyon û bişaftinê ku hewl dide nasnemeya gelê kurd di nav nasnameya gelên serdest de bimehînin û hêdî hêdî ji nav bibin. Zilmek ku bi awayekî sîstematîk tê meşandin ku gelê kurd ji yek li bingehên sereke yên nasnameya xwe bihê dûrkirin û bêparkirin. Encam jî eva ye ku keç û xortên kurd li Îran, Turkiye û Sûriyê dema qonaxên xwendinê xilas dikin, herî kêm zimanê Kurdî dizanin û bikar tînin. Ji ber ku perwerde bi zimanê wan ê netewî qedexe ye û dixwazin wan bi neçarî zimanên Turkî, Farsî û Erebî bipazrêzin û bikin bingeha nasnameya xwe. Ev siyaset û bername diçe çarçoveya trajîdiyayek mirovahiyê di sedala 21`an de.

Li Îranê di serdema Rizaxan de, li çarçoveya nûjenkirina civakê û guhertinan de asîmîlekirina neteweyên ku li Îranê dijîn bû stratejiya dewletê û hemû awayên parastina ziman, çand û kultûra wan gelan hate qedexekirin. Hem dewleta dîktatûr a Pehlewî û hem jî rêjîma Komara Îslamî ya Îranê siyaseta qedexekirina zimanê kurdî û yên gelên din jî meşandine. Armanc betalkirina kurdan ji hesta neteweyî û parastina bingehên nasnameya wan a neteweyî.

Ligel ku siyaseta asîmîlekirin û hewildanên dagîrkerên Kurdistanê bona qedexekirina zimanê kurdî û yên gelên din divê bi nivîsan pirtûkan û lêkolînan berfireh bihê şirovekirin, lê pirsa sereke eva ye kurd niha divê çi bikin ?

Zimanê kurdî pêwîstî bi şorişeke berfireh heye bona zindîman û pêşveçûnê. Ji ber ku dijminên nasnameya me dixwazin zimanê me bikujin û bi tevahî ji nav bibin û heta ber çavên me sivik jî bikin. Her eva ku nifşa îro gellek car zimanê dagirker di jiyana xwe ya rojane de bi şanazî bikar tîne û naxwaze zimanê xwe yê neteweyî bikar bîne. Ev yek erk û wezîfeya me yek bi yek e ku bi micidî liv û tevgerên xwe berfireh û bi bername bikin. Di rastî de xwendin, nivîsandin û perwerdebûn û bikaranîna zimanê Kurdî mafeke sereke yê me ye ku tê înkar û qedexekirin. Di jiyan û xebata me de divê ziman weke bingeha nasnameya me ciheke taybet bigire. Divê daxwaza xwendin û perwerde bi zimanê kurdî bibe bingeha hemû xebat û çalakiyan li navxwe û derve. Malbat divê bi her awayê mumkin zarokên xwe bi zimanê kurdî perwer bikin. Malbat roleke girîng û sereke dilîze di vê qonaxê de, ji ber ku îmkan û derfetên daxwazkirin bi perwerde bi zimanê Kurdî aliyê kêm li Îranê bezandina hêla sor e ji aliyê dewleta kurdkuj a Îranê, lewma malbat dikare vê valahiyê tejî bike. Piştre di hemû qadên civakê de xwendin, nivîsandin û perwerbûn bi zimanê Kurdî bibe armanceke sereke yê jiyana me. Hemû gelên cîhanê bi başî zimanê xwe diparêzin û xizmeta wî dikin, lewma xizmetkirin û parastina zimanê me jî erkê me ye, ev yek ji awayên berçav ên xebata neteweyî ye û em hemû li hember vê pirsê berirsyar in.

# Betalî di Îranê de sînorê %70 derbas kir

Asta betaliyê di welatê Îran de, sînorê 70% ji derbaskiriye û her bi vê sedemê jî, asta hejariyê di wî welatî de bilind bûye.

Tevî wê ku Îran di warê çavkaniyên xwezayî û nemaze berhemanîna şevatê de, welatekî dewlemend û pirr behreye, yek ji wan welatan tê hesabkirin ku, amarên betaliyê bi awayekî berçav bilind dibin û di warê dabînkirina hêla kar de jî, di asta welatên cîhan de li astekî gellek nizim de ye û di vê derheqê de jî, li sala 1398`an hêla betaliyê li welatê Îranê, sînorê 70% ji derbaskiriye.

Di amarên salane de, ku derheq betaliyê, Îranê tomar û belav dike, Kedkarên bînasaziyê zêdetirîn asta betaliyê ji xwe digirin, ku sedema serekî ya vê yekê jî, bilindbûna alav û tiştên avedaniyê didin zanîn, û bi sedema dorpêçên aborî yên ku li dijî Îranê ne, sedemên kirîzên navxweyi yên wî welatî û bitaybet kirîza aboriya rejîmê dane zanîn.

Her di vê derheqê de, li rojên derbasbûyî, “Hadî Sadatî” cêhigirê Navenda Kedkarên Avedaniyê yê Îranê ragihand ku, di sala nû de, asta betaliya Kedkarên bînasaziyê di seranserê Îranê de, gihîştiye 60% ji û sedema wê jî bo bilindbûna alav û tiştên avedaniyê daye zanîn.

Niha di Îranê de, betalî bûye diyardeyekî metirsîdar, ku çavkaniya diyardeyên civakî yên din û nemaze diyardeyên wekî, hejarî birçîbûn, bilindbûna amarên zarokên karker bo dabînkirina hewcehiyên jiyana malbatan, bilindbûna asta telaqê û hilveşîna jiyana hevpar, qaçaxkirina madeyên hişber û ... hwd, pirsiya welatê Îran giritiye.

Tevî vê ku, Navendên pêwendîdar yên rejîma Îranê,



tu rêcareyek, bi teybet li warê amar, rêjeyeke dirust û zanyariyên rast belavnekiriye, û nûçegihanên derveyê Îranê, bi awayekî nefermî, asta betaliyê li wê welatî û di hemû warekî de, zêdeyê 70% ji ragihandine, ku li gorî ew amarên nefermî, egera zalbûna birçîbûnê li ser hemû civaka Îranê, ber bi bilindbûnê çûiye.

# Madeyên sirker ji aliyê Spaha Pasdrana terorîst ve tên belavkirin

Saziya Spaha Pasdarana terorîst, hemû coreyên madeyên sirker li Kurdistan û Îranê belav dike.


Li gorî nûçeya ku gihîştiye malpera “Kurdistanmedia”yê, li ser sînorê bajarê Bane piştî nasandina çend mohreyên ku madeyên sirker belav dikirin, ji aliyê Spaha Pasdarana terorîst ve piştevanî jê dihatinkirin, û hêzên îtila`ata rejîmê jî bo xapandina bîr û ramana giştî, êrîşî ser van çend mohreyên xwe kirine û ev desteser kirine.

Li gorî vê raporê, 4 heza hebên coda yên madeyên sirker dest biser de giritine ku, îtila`ata rejîma Îranê, bo xapandina xelkê ev mohreyên xwe desteserkirine.

Deste û girûpên girêdaiy saziya Spaha Pasdarana terorîsta rejîma Îranê, bi alîkariya binke û navendên girêdaiy vê saziyê, li bajarên Kurdistana Rojhilat, bazirganiya madeyên sirker dikin.

Rejîma Îranê bo çêkirina şaştiyê di bîr û ramana xelkê de, bi navê şerê li dijî madeyên sirker heyam bi heyam girûpên xwe desteserdike û piştre va nazad dike.

Welatê Îranê, mezintirîn cihê barizganîkirina madeyên



sirker e di cîhanê de, û herwisa yek ji mezintirîn welatê bikar anîna madeyên sirker li cîhanê tê hesab kirin.

# Welatiyekî temen 38 salî li bajarê Seqizê dawî bi jiyana xwe anî

Welatiyekî temen 38 salî li bajarê Seqizê dawî bi jiyana xwe anîAjansa Kurdpa: welatiyê Kurd yê xelkê yek ji taxên bajarê Seqizê, bi sedema betaliyê, dawî bi jiyana xwe anî.


Li gorî rapora gihîştî bi Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, li roja Înê, 20`ê Banemera 1398`an(10`ê Gulana 2019`an), welatiyekî temen 38 salî û xelkê bajarê Seqiz yê bi navê, Hesen Mehmûdî, dawî bi jiyana xwe anî.

çavkaniyeke agedar di vê barê de bi Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê re ragihandiye: Ev welatiyê Kurd bi sedema betalî û bilindbûna asta kirêya malê, kutayî bi jiyana xwe aniye.

Herwisa vê çavkaniyê daye xuyakirin ku, navbirî xwediyê jin û zarokane, û kirênişîn bûye.

Bi gotina civaknasan, bilindbûna asta xwekujiyan û zêdebûna xesarên civakî, diyardeyeke çend alî û çend sedeme û pêwîstî bi bas û analîzek hûr heye.

Sedemên wekî, hejarî, nebû-



na wekheviya behrebirin ji saman, bêkarî, guhirîna bihayên civakî û zêdebûna cudahiya qatên civakê, ji hegerên xwekujiyan li welatê Îran tên hisêb kirin.

# Dengbêj Moseyîb kî ye

**Yek ji dengbêjên dengxweş ji devera Makûyê, dengbêj Moseyîb Gulşenzade ye.**

Moseyîb jidayîkbûyiyê sala 1340`î a Rojî li gundê gol ( Gola Morse) ji dewera bajarê Makûyê ye, û navê babê wî Ferzinde ye ji eşîreta Qendikan ji êla Celalî.


Moseyîb her ji dema zarokatiya xwe de hogirî bi dengbêjiyê hebûye, û dibêje ku ji dema 6 saliya xwe de, hez ji guhdan bi dengê radyoya Rewanê kiriye, dibeje: Her rojê ber radiyoyê dirûniştim û min guhdariya dengê Karapêtê Xaço, Şeroyê Biro û yên din dikir, û stranên wan fêr dibûm û li her ciyek ku derfet heba min ew digotin.

Tê bîra min; yekemîn strana ku fêr bûm bi navê: Hêdî pajo ez birîndar im, ji Mihemedê Silo bû.

Rojek ku min ev stran li qutabxanê de strand û mamosta jê agadar bibû ku bi 15 derbên darê ez kutam; serbarê vê ku min pir hez ji ders û qutabxanê dikir, lê mixabin ji tirsa mamosta min dersxwendin bi cî hişt, lê min dengbêjî her domand ku babe min jî her piştgirê domandina dengbêjiyê bû.
Dengbêjek bi navê Elî Kaşo ku îro çûye ber dilovaniya Xwedê, bo min rola mamostayekî hebû, û min piraniya stranên wî ji ber kiribûn, û min distrandin.

Rehmetî Elî ji eşîreta Qizilbaşa Celaliyan bû ku dengek pir xweş û axiftinên hêja hebûn, her wisa li malbata me de apê Silêman jî dengek xweş hebû, ku yek ji wan kesan bû, ku bandor li ser min hebûn bo domandina dengbêjiyê.


Moseyîb pir bas ji deng û stranên Kawûs Mîlanî dike û bawir e ku di navbera dengbêjên dewerê de, Kawûs ji aliyê deng û nasîna stranan û her wisa dengbêjan, ji aliyê helbest û mîlodiya stranan de, zanînên herî baş hene.
Moseyîb Gulşenzade jî parek zor ji helbest û sitran û muzîka xwe, bixwe aniye pê û afirandiye wek:
Yarmiq
Goma maro
Behra Urmiyê
Soma biradost
Ferzinde li ada xanê
Û …hwd.



Dengbêj Moseyîb li piraniya festîvalîn muzîkên hundir ên Îranê de pişkdarî kiriye, û gellek caran stran strandine, û xelat jî wergirtine.
Ev endamê mala dengbêjan li binka Ehmedê Xanî li Urmiyê de bûye.

Li 3.emîn festîvala folklora Kurdî li sala 1390`î de li bajarê Pîranşar de wek dengbêjê bijartî hate nasandinê.
Moseyîb heya niha 4 CD û kaset berhev û weşandine, ku li gora gotina hozan Kawûs Mîlanî, yek ji giringtirîn taybetmendiyên Moseyîb, hebûna bîrdankeke bihêz e, ku li demek kurt de dikare bûyeran bi zûkatî bîne ser forma helbestan û bistrîne.
Moseyîb stranên Azerî jî bi hêjayî distirîne. Niha ew li gundê Qurt Tepe li 5km rêka Urmiye- Mihabadê de dijî, û xwediyê 5 zarokan e.

# Şivan Perwer mizgîniya berhemên nû dide



**Şivan Perwer li Kopinhagina Danîmarkê bi hezkiriyên xwe re hat ba hev û konserteke şox û şeng û rengîn lidar xist.**

Perwer pêş konsertê, xem û hêviyên xwe yên li ser pirs û doza Kurd anî ziman, û banga yekrêziya nav mala Kurd kir.
Şivan herwiha mizgînaya berhemên xwe yên nû jî da hezkiriyên xwe.

Wekî ku di stranên xwe de jî gellek caran aniye ziman xem û hêviyên wî giran in û van hêstan pêş konserta xwe ya li Kophenagê diaxve û balê dikşîne ser xebat û amedekariyên xwe yên dawî yên hunerî.

Perwer, mizginî dide hezkarên hûnera kurdî û dibêje wî di salên dawiyê de, li ser dîrok û çanda Kurdistanê tije berhem afirandiye û wê di demek nêzîkî de tomar dike.

Yek ji wan taybetmendiyên navdar ên konsertên Şivan Perwer axaftinên wî yên siyasî ne.

Ew gellek caran di navbera stranan de ji mûzîkê dûr dikeve û bi şîret, rexne û hêviyên xwe behsa pirs û doza Kurd dike.

Sedema vê jî xemên wî yên giran ên netewî ne û dixwaze xelkê wî di zûtirîn dem de bigihîje rizgariya xwe.

Ji bo vê jî hêviya herî mezin başûrê Kurdistan e û banga yekrêziya nav mala Kurd dike.

Li gorî axavtinên Şivan Perwer, pîvanên serekî yên rizgariya Kurdan yekrêzî, netewekarî û afiradina hişmendiya hilberînê ye.

Çand û hûner jî, di vê hişmendiya hilberînê de cihek girîng digire û ew amadeye her di xizmeta xelkê xwe de be.

# Zimanê Kurdî

"Çito" :

"Çito" jî cînavekî pirsiyarî ye, ji cînavê "çiton" kurtebir bûye. Ev cînav jî rewşa çawaniyê bi awayekî pirsiyarî diyar dike.

Wek :

- Tu çito yî ?
( Tu çiton î ?)

Têbîniyeke giştî :

Diyar e ku rola cînavê "çi" di warê avakirina cînavên pirsiyarî, yên lêkdayî de roleke giring e. Bo vê yekê jî hindek bêje, wek (qas, kes, tişt...) gelek caran bi "çi" yê re tên xebitandin : (çi-qas, çi-kes, çi-tişt...). Hindek nivîserên rêzimana kurdî ketine wê gumanê ku ew bêje pevxistî ne û wekû cînavên pirsiyarî yên lêkdayî, gerek bi hev ve bêne nivîsîn,

wek :
(çiqas, çikes, çitişt). Bi dîtina min, di van gotinan de, "çi" tenê cînavê pirsiyarî ye, lê (qas, kes, tişt) gotinin serbixwe ne, gerek serbixwe jî bêne nivîsîn, wek : (çi qas, çi kes, çi tişt) . Li vê gorê, bêjeyên "çi-ton, çi-tov" jî dikevin ber vê pîvanê .

b- Alavên pirsiyarî :

Alavên pirsiyarî ew bêje ne ku cihê navan nagrin. Tenê şêwazekî pirsiyarî peyda dikin û di pêvajoya hevokan de pirsa zelalkirina têgehekê yan bûyerekê dikin . Alavên pirsiyarî di zimanê kurdî (K J) de ev in : (Aya, ma, qey, gelo).

-"Aya" : Ev alav bi pirranî li kurdistana naverast, rojhilat û başûr bikar tê . Di zimanê Farisî de jî, bi resenî tê xebitandin. Di hevokan de, ev alav bi wateya (ma, gelo) bikar tê . Wek : - Aya tu ne kurrê Remo yî ? ( Ma tu ne kurrê Remo yî ? ) - Aya ew kes ne hevalê te bû ? ( Gelo ew kes ne hevalê te bû ?)

Ehmedê Xanî dibêje :( ) Aya ne te çêkirin muqabil Her yek te kirin bi hev mu'adil ? Ev alav digel cînavên pirsiyarî jî bikar tê : - Aya ev çi toz û dûman e ?!

Xanî derbarî kurdan dibêje : ( ) Aya bi çi wechî mane mehrûm ?! Bilcumle, ji bo çi bûne mehkûm ?!

- "Ma" : Ev alava pirsiyariyê jî, bo zelalkirina

têgehekê yan bûyerekê bikar tê .
Wek :

- Ma we karê xwe nekiriye ?!
- Ma Lalîxan ne keça Beko Ewan bû ?

Ev alav jî, bi cînavên pirsiyarî re tê xebitandin : - Ma kê ji min xwest û min nedayê ?!

- "Qey" : Alava "qey" jî, bo ronîkirina têgehên

nezelal bikar tê .

Wek:

- Qey tu îroj neçûyî karê xwe ?!
- Qey nayê bîra wan me çi got ?
- "Gelo" : Ev alav jî wekî yên dîtir bikar tê .
Wek:
- Gelo Serdar hêj girtî ye ?
- Gelo, kî ji me mezintir e ?
- Gelo kîjan çemê Kurdistanê dirêjtir e ?

C- Şêwazê pirsiyariya bê

cînav û alavên pirsiyarî:
Di zimanê kurdî de raweyên pirsiyariyê bêyî xebitandina cînav û alavên pirsiyarî jî dirust dibe , Anku wateya pirsê, bo zelalkirina hindek têgehan, bê cînav û alavên pirsiyarî pêk tê. Hingê pêdivî ye ku nîşandeka pirsiyariyê (?) li dawiya hevoka pirsdar bête danîn . Wek: - Tu çûyî Laleşê ? - Reşo ji Qamişlokê hatiye ? - Havîn xweş e yan zivistan ? - Zarokên we zanin bi kurdî bixwînin ?

3- Cînavên nîşandan

Cînavên nîşandan ew cînav in, yên ku navên mirov, canewer û tiştan destnîşan dikin . Wek :

- Ev mirov mêvanê min e
- Ew keça ha kî ye ? - Tu vî hespî difroşî ?

**Dom heye...**

# Agirî

Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (350)

## Merasima bidawîhatina dewreyeke fermandehiyê li çiyayên sînorî



















